# "Ti kes dev ji doza xwe berneda û axa xwe terk nekirin"

**Heypeyvîna Riseup4Rojava bi Hevalê Mehmed**



**Despêka sala 2026 hêzên hegemon carekê din kom bûn û hewl dan bi rêya êrîşekê berfireh şoreşa rojava têk bibin. Li rojava ji bo parastina destkeftiyên şoreşê seferberiya giştî hat îlan kirin û civaka rojava rabû li ser pîyan. Ji hemû parçeyên kurdistanê û ji ewropa jî bi taybetî ciwanan bersiv dan seferberiya giştî û tevlî parastina şoreşê bûn. Rojava carek din dîroka xwe ya berxwedanê nivîsand û bi vî awayî êrîş hatin sekinandin. Tevlîbûyîna ji derve rojava gelek hêz da berxwedanê û yek ji ciwanên ku ji bakurê kurdistanê hatin jî hevalê Mehmed e. Heval Mehmed, tu dikarî xwe bidin nasîn û ji me re parve bikin tu çima hatî rojava?**

Navê min Mehmed e û ez bîst û du salî me. Ez li bakurê kurdistanê ji dayîk bûm û li wir mezin bûm. Min têkoşîna PKK û rêbertî dema ez 18 salî bûm nas kir û gava bûm 22 salî ji ber seferberiya rojava ez tevlî şoreşê bûm. Dema ez li bakur bûm ez gelek ji şehîd Rojger Hêlîn û şehîd Asya Alî bandor bûm. Min berê jî dixwest tevlî şoreşê bibim lê ji ber hin probleman min derfet nedît û min hinge biryara tevlîbûnê neda heya ku ez ji xwe bawer bibim. Gava seferberîyê hat îlan kirin ez ne rehet bûm û min dîmenên rojava jî didît. Lewma jî vê carê min ekîd biryara tevlîbûnê da û hatim rojavayê kurdistanê. Dema tu ji bakurê dîmenên rojava dibînî wekî ku jiyan têde nîn e didin nîşan dan lê dema min jiyana rojava jiyan kir pê hesîyam ku li vir jî jiyanekî bêhempa heye û gelê vê derê ji xwe bawer e û ji bo parastina welatê xwe dikare her tiştî bikin û heger dem were dikarin ji bo welatê xwe jiyanê xwe jî ji dest bidin.

**Stratejîya parastina rojava stratejîya şerê gelê şoreşgerî ye. Tu jî wek ciwanek bandor bûyî û berê xwe dayî rojava. Wateya şerê gelê şoreşgerî ji bo te çi ye?**

Min berê gelekê wisa xurt nedîtîbû û dema hatim vir jî ez şahîdê vê tiştî bûm ku ji bo watedayînê mirov çiqas biaxive jî gotin kêm dimînin. Dinyayê tiştekî wisa qet nehatîye dîtin û rojava jî ji dinyayê re û hemû gelên dinyayê re têkoşîn û berxwedana xwe yê şerê gelê şoreşgerî nişan dide û di dirokê de cihekî pir giring digire. Ji bo parastinê ji zarokan heya kal û pîran hemû kes nobet girt û hemû kes xwest ji bo welatê xwe tiştekî bikin û gelekî şehîd di vê rêyê de xwîna xwe rijand û morala malbatên şehîdan jî her tim xurt bû û ti kes dev ji doza xwe berneda û axa xwe terk nekirin. Dema ez çûm merasîma şehîdan hevalên ku şehîd ketin nava wan de şehîdên ereb jî hebûn û gel hemû yek bûn û yek dil bûn. Hin propaganda hene ku dixwazin vê şerê wekî şerê ereb û kurd rayî mirovan bidin lê ew hewldan jî têk çû û carekê din me ji netewa demokratîk û biratîya gelan bawerîya xwe nû kir û em dizanin heger em li dijî propagandayên reş û êrîşên dijmin nijad ferq nake yek bibin em dikarin civakek sosyalist û wekhev ava bikin û bi hev re bijîn.

**Tu çawa hatî rojava?**

Ez ji bakurê derbasî rojava bûm û rê gelekî zehmet bû. Birînên min jî çêbûn lê dema ez hatim vir gelê rojava min bi xwîngermî pêşwazî kirin û min hemû birînên xwe ji bîr kir û di serê min de tenê azadî û parastina welat hebû. Berîya ez ji bakurê Kurdistanê hatim vir min digot ku milê ziman û çandê de hin cûdatî çêbin lê dema ez hatim vir hemû tabûyên min çûn û ez ketim ferqê ku navbera me de tenê sînorên sextê û çêkirî hene.

**Bi berxwedana gelê rojava û dervê rojava êdî îtîfaqa agirbest çêbû. Li gorî vê rewşê çend sazî tên di dewletê de entegre kirin. Ji dervê rojava kes hene ku ditirsin şoreşa rojava ji destên me biçe. Tu ji wan re çi dibêjî?**

Em wekî jiyana xwe yê berê bijîn û tenê sazî û artêş girêdayî dewleta Sûrîyê bibin û destkeftîyên me ji dest naçin. Di têgînên hevpeymanê de alîyê YPJ de em dixwazin dewleta Sûrîyê YPJ nas bike û zimanên me, dibistanên me û sazîyên me qebûl bike û ew destkeftîyên ku me bi xwîna bi hezaran şehîdan hildayê em wan tiştan bernadin û em her dem dixwazin aştî û wekhevî pêk were û hemû gel azad bijîn û ti carî bin zextê de jiyan nekin.

**Şoreşa rojava şerekê pir dijwar dît û hîna jî ihtîmala êrîşên çeteyan heye. Di vê rewşê de ji bo te aşitî çi ye?**

Ez dikarim wisa bêjim ku heger rêbertî vê şerê nebida sekinandin li ser gelê me komkûjîyekî pir bixwîn û biêş bihata û gelekî mirovên bê sûc û bê guneh bimirana û bihata vê astê ku vebiguherîya şerê ereb û kurda û daxwaza dijminan û dewletên hegemon û emperîyal pêk bihata. Lewma pêwist e em bi aştî destkeftîyên xwe biparêzin. Piştî vê pêvajoyê jî ji bo em jiyanekî komînal û azad ava bikin pêwist e em birexistinkirina xwe xurt bikin û gel birexistin bikin û morala hemû kesî xurt be. Ji bo vê jî lazim e em rê nedin propagandayên reş ku dixwazin gel tevlîhev bikin û li dijî wan jî hem gel hem jî em bawerîya xwe bi rêbertî bînin û ji bo vê pêvajoyê baş pêş ve biçe em mecbûr in ku hewldanekî bihêz nîşan bidin. Ihtîmala êrîşên çetêyan hîn jî heye. Lewma jî gel hîn jî nobet digirin û ji bo parastinê ji ciwanan heya ixtîyaran hemû amade ne.

**Şoreşa rojava jî wek şoreşa jinê li dijî zilamparestîya rejîmên derdora xwe disekîne û bû mînak ji bo hemû cihanê. Te têkoşîna tevgera jin a rojava di vê pêvajoyê de çawa dît?**

Dijmin niha ji kezîyên jin ditirse û hewl dide ku destkeftîyên jin tune bike lê wekî apocî em destûr nadin ku dijmin êrîşa xeta jinê bike, ji ber ku xeta jin xeta me ya sor e û rêbertî ji bo vê mijarê gelekî hewl daye. Dema bajarên ereb hatin êrîş kirin û ketin destên dijmin, me dît çawa sembolên azadîya jinê dîsa hatin pûç kirin. Li tebqayê heykela şervana YPJ hat imha kirin û hemû dinya dît çawa zilam derketin li ser kolanan û slogan li dijî şoreşê avêtin. Vê çaxê diyar bû ku ev ne şerekê navbera gelê kurd û ereb e lê bi rastî şerek e ku pergala zilamperest li ser şoreşa jinê ferz kir. Tevgera jin bersiva herî xurt da û ji şervanên wek şehîd Denîz Çiya ku wek suikastcî li Helebê heya dawî ber xwe da heta dayîkên gundên cebhê ku ji bo şervanan xwarin çêdikir cihê xwe girt. Em dizanin ku li bajarên ku HTŞ lê ketîye jin rewşekê pir giran jiyan dikin. Lewma pêwist e em li dijî zilamperestîyê ji bo azadîya jinê di jineolojîyê de israr bikin û bi vî awayî têkoşîna xwe di vê milê de xurt bikin û tu carek rehet nebin.

**Îro em dibînin ku li ser hemû dinya şer zêde dibe. Di serî de jin, ciwan û gelên bindest tên hedef kirin. Wek li rojava jî herî zêde ciwan tevlî şoreşe bûn û axa xwe diparêzin em dibînin ku ciwan li her derê li dijî vê şerê radibin. Banga te ji bo hemû ciwanan çi ye?**

Jixwe em dibînin ku her demî di şer de zerara herî zêde jin û zarok û ciwan dibînin û ji şer herî zêde ew bandor dibin. Her cûreyên şer ji bo mirovahî xeterîyekê mezin e û zerar dide hemû cihanê. Pêwist e li dijî şer em di aştîyê de israr bikin û her demê mirovahî esas bigirin. Banga min ji bo hemû ciwanan hewl bidin ku şerxwaz nebin û ji bo ku aştî pêk were li dijî listokên hegemon û hêzên serdest, ji bo biratîya gelan û aştîya hemû cihanê sosyalîzmê de û xeta azadîya jinê de em xwe kûr bikin. Armanca me jî pêwist e li ser vê esasî bibe û ti carî hêvîya xwe winda nekin û tim bi moral û ji armanca xwe bawer tev bigerin û ji bo jiyanekê azad tim bi hêvî bibin. Serkeftin ji bo hemû rêhevalên sosyalîst û aştîxwaz dixwazim. Silav û rêzên şoreşgerî!